

Lêzanîn jibo dêbavan/sergêr û zarokan/nûciwanan derbarê Rapirsîna Ungdata

Îsal, Rapirsîna Ungdata di dibistana zarokê te da dê pêk were. Hemî xwendekarên dibistan pû Şaredariyê hatine vexwendin ku di vê rapirsînê da beşdar bibin. Armanc ev e ku nima û dîmeneke giştî ji rewşa pêkhatina zarok û xortan bi awayê xweçihî bi dest bînin. Loma, girîng e heta radeya pêkan di vê rapirsînê da beşdar bibin. Ev rapirsîn di nîvsala biharê da da li dibistanê dê pêk bê.

ARMANCA RAPIRSÎNÊ

- Jibo zarok û xortan vê derfetê dabîn dike ku derbarê rewşa mezinbûnê li şaredariyê hin lêzanînan bidin rayedar û berpîrsên xweçihî.
- Derbarê rewş û şert û mercên mezinbûna zarok û xortan jibo hevkarîya rayedarên kantî / şaredariyê bi vê koma mtemenî lêzanînen nû bîn wergirtin.
- Berhevdanîn digel kesayetiyên din ên neteweyî û şaredariyan û alîkarîya bo lêkolînê pêkan bibe.

LI RAPIRSÎNA UNGDATAEMÊ DERBARÊ ÇI Babetan BIPIRSIN?

- Têkiliya bi dibistanê, dost û dêbavan ra
- Demên betlaniyê û çalakîyên demên betlaniyê
- Bikaranîna medyayê
- Tendurustî, rihetî û çawaniya jiyane
- Zorbêjî

Di asta navîn a dewreya yekem:

- Binpêkirina qanûnê, tundî û bikaranîna madeyên hişber
- Asta xwendabûna dêbav/sergêran

RAPIRSÎNA UNGDATA ÇAWA PÊK TÊ?

- Saetek li dibistanê jibo kemilandin û pêkanîna Rapirsînê hatiye terxankirin.
- Ev rapirsîn bi awayê elektronîkî û bi tîketina nav rûpela bersivdanê ya Ungdata bi bikaranîna kodeyê rêpêdayî ya yekcarî û random pêk tê.
- Xwendekar bi tîk-kirina pirsnameyê bersiva pirsan didin. Bijardeyek heye ku pirsên heyî li pirsnameyê bi dengê bilind dixwîne. Heke ev kiryar were bikaranîn, divê berguhk were bikaranîn.

JİYANA KESANE

- Ev rapirsîn nenas pêk tê û naskirina beşdaran bi riya daneyên komkirî nepêkan e.
- Dema weşandina encamên rapirsînê, dê kesên beşdar neyên naskirin.

BEŞDARÎ DILXWAZÎ YE

- Ev Rapirsîn dilxwazî ye
- Kesên ku bersivê didin dikarin dev ji pirsên ku naxwazin bersiva wan bidin, berdî û heke bixwazin di heyama pêvajoya bersivdanê da, dikarin dawî li rapirsînê bînin.
- Dêbav/sergêr dikarin bi haydarkirina fêrkarê tîkildar/dibistanê, vebijêrin ku zarokê wan beşdarî Rapirsînê nebe.

AMADEBÛN

Xizmetên tendurustiya dibistanan kiryarên pêwîst ên amadebûnê piştî rapirsînê jibo her yek jixwendekarên ku hewceî pê heye, berçav girtiye.

KÎ BERPIRSÊ UNGDATA'YÊ YE?

Ev rapirsîn ji aliyê enistîtûya lêkolînen civakî ya Norwejê NOVA li OsloMet (Zanîngeha 'Oslo Metropolitan') û Navenda Hêjatiya Dermanî û Elkolî ya Navçeyî (KoRus), li gorî tayînkirina şaredariyê pêk tê.

GELO PİRSEKE TE HEYE?

Jibo wergirtina lêzanînen pirtir derbarê rapirsînê, ji kerema xwe digel dibistanê an KoRus ya navçeya xwe bikeve tîkiliyê.

Heke dixwazî versiyona Norwejî an Inglîsî ya Pirsnameyê werbigirî, tu dikarî bi tîkiliya bi KoRusra, vî karî bikî.